

Birêz Mihyedîn Şêx Alî digel paltokê bi cîgeha Şevger re

Xemxwarê welêt

Piştî min li ew çend kîteyên devkî yên bersivî yên mamoste M.Ş.A di paltokê de , bi cîgeha Şevger re guhdar kir . Herweha ew çend nirxandinên ji wê axaftinê re, yên mamoste Mihemed Se,îd Alocî û Cankurd jî xwendin; Min dît , ku pêwîste ez hin bersivên mamoste Ş.A û nirxandinên herdu mamostên li jor bi nav bûne û ew wergerandina erebî ya wan bersivan , bi çend têbînan binirxînim.

Bi rastî pirsên ku ji mamoste Ş.A hatine pirskirin ne xuya ne , lê ji bersivan mirov têdighê , ku pirs çi ne ? Mamoste weha bersivên pirsê dirêse : 1- Ala Sûriyê , ala me ye jî , em rêza wê digrin û diparêzin , û em ne bi çirandin û binpêkirina wê re ne , wek ku hin dixwazin bi wî awayî licûyê yan bicikirinê werbigirin . 2- Çareserkirina pirsê netewî ya Kurd li Sûriyê di siya vê heyam û rijîmê de ne gengaze . Lê, gengaz heye em bi hev re wek Tevergera Kurd li Sûriyê digel hêzên niştimanî , ji vir ta çend salên bê , kanibin ew çewtiyên dîrokî ku, di dermafê gelê Kurd de kiriye serast bikin . Wek nimûne : Kembera erebî , serjimara awerte , hilanîna erebkirinê,....û H.W.D. 3- Di bikaranîna têrmên mîna tayîfî û diktatorî , me di belge û weşanên xwe de bi kar nanîne. Lê em dibînin rijîma Be, is rijîmeke nijad û giştî ye , mîna rijîma Çawsîsko li Romaniya û rijîmên li Rojhilatî Ewropa. Guherînen em dozdkin , guherînen demoqrat û li dû hev, Kurd û Erebi hev re , û li ser şopa Danezana Şamê . 4-Ez ne bawer im wek kes, otonomî û federalî, li Sûriyê dirûşmên xebatê ne ,

tenê şaşiyên dewletê yên dîrokî, di dermafê gelê Kurd de, di van çend salên bê de, bi xebata me tevan , çi siyasetvan û rewşenbîrên Kurd ,gengaze ji holê rabin . Herweha ez bawerim ,ku rêvebirên partiyên Kurd gihane zanîna ku xebat ne tenê bi hildana dirûşman e û hew. Ya rast ew e , ku dirûşmê were hildan , divê li derve û hundir , mirov lê xwedî derkeve . 5-Taybetmendiyeke rewşa Kurd li Sûriyê heye . Em tu Kurdistana li Sûriyê çênakin. Em wek partiya Yekîtiya ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , pirogrameke me rêzanî , zarzimanek û ragihandineke me berpirsiyar heye. Herweha em naxwazin bi du rûyan, du zimanan û minafiq bin. Em wek P.Y.D.K rêza serokomar digirin, herweha em jî, û ez bawerim partiyên Kurd ên dî jî , çi daxwazên xwe hebin , ew ji serkomar doz dikan.

Ji van bersivên mamoste dixuye ku ew bi tevayî, li gor pirograma rêzanî ya P.Y.D .K axivî ye .Lê di baweriya min de , li hin ciyan şaş çûye. 1- Kembera erebî,serjimara awerte , erebkirinne şaşî ne , ew siyaseteke pilankiriye , û ji bo tunekirina gelê Kurd e .2-Raste çirandina ala Sûriyê tişteki şaşê û zirar jê heye , lê , ne her kesê ku diçirîne keysebase û dixwaze li welatê lê , pê were bi cikirin.Di baweriya min de ne hewcebû mamoste ev gotina dawiyê bigota .3-Gereke serokomar ciyê rêzgirtinê be, lê , ew di ber van ton siyasetên bi ziyar di derheqê xelkê Sûriyê bi tevahî û ya gelê Kurd de bi taybetî , **D.R (11)**